# Perwerdeya Islamî

## Seretayî

## 4

2022 / 2023
1444

**Amadekar:**
Komîteya Perwerdeya Islamî

**Lêveger:**
Komîteya Şopandinê,
Komîteya Redekteyê,
Komîteya Dîzaynê

**Mafên amadekirin û weşanê ji Saziya Minhacan û Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re parastî ne.**

**Çapa yekem**
**2022 / 2023**
**1444**

## pêşgotin

Li gorî plana Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û di bin serpereştiya Saziya Minhacan û Kongireya Islama Dîmokratîk de, em pirtûka "Perwerdeya Islamî" ya refa çaran a qonaxa seretayî pêşkêşî we dikin. Ev yek di çarçoveya perspektîfên ku baldariyê didin curetiya fêrkirinê û bi şêwazekî perwerdehî û bipêşketî baştirkirina berhemên wê ku dixwazin reftarên erênî û sincî li gel xwendekar xurt bikin, pêk tê. Bi rêya xurtkirina reftarên erênî û sincî, dixwaze wan nirxên perwerdehî weke reftar di jiyana piratîk de, pêk bîne. Her weha dixwaze, ew xwendekar hevsengiyekê di navbera berpirsyariyên xwe yên kesayetî û civakî de, pêk bîne. Ji ber vê yekê, me xwest di vê pirtûkê de, ziman zelal be û şêwaz hûrbîn be.

Ev pirtûk ji pênc beşên ku mijarên wan cihêreng in, pêk tê.  Mijarên wê di çarçoveya Qurana Pîroz, gotinên Hz. Pêxember, jînenîgariya Pêxember û sincê de ne. Ev mijar bi awayekî hevtemamker û lihevhatî, hatine hûnandin. Her weha her beşek, xwedî armancên fêrkirinê ne û di dawiya her beşekê de, tê pêşbînîkirin ku ev armanc ji hêla xwendekar ve, pêk bên.

Bi awayekî giştî, di destpêka her waneyekê de, deqên Qurana Pîroz, gotinên pêxembertiyê û nirxên sincî hene. Di wan waneyan de, komeke ji çalakiyên piratîkî ku bi çavdêriya mamoste, di lênûsa xwendekar de, tên çarekirin, hene. Bi vê yekê xwendekar weke tewareya pêvajoya perwerdehiya nûjen, tê dîtin da ku bikare karîn û hêzên xwe, bixwe berhênan bike. Ev yek jî bi rêya vekirina dergehê afrîneriyê û dûrketina ji şêwazên ezberkirina kilasîk û vegotinê, pêk tê.

Di dawiya her waneyekê de, nirxandineke bi navê "ez têgihiştina xwe taqî bikim" heye. Ev yek derfetê dide xwendekar ku gotûbêjan bi kesên dîtir mîna mamoste, heval û xizmên xwe re, bike.

Ji ber ku mamoste bingehê birêvebirina pêvajoya perwerdehiyê ye, em hêvî ji mamosteyên xwe (kadroyên perwerdehiyê) dikin ku naverokê, bi awayekî nimûneyî bi kar bînin. Her weha em ji sermiyanên xwendekaran ên rêzdar, hêvî dikin ku zarokên xwe bişopînin û reftarên wan ber bi başiyê ve bibin; bi awayekî ku sincên baş û nirxên bilind li ber çavên wan bên dayîn.

## NAVEROK Û BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ


| Qonax | Wane | Rûpel | Hejmara parên xwendinê | Meh |
|---|---|---|---|---|
| Qonaxa Yekem | **BEŞA YEKEM** | 7 | | |
| | SÛRETEL-FATÎHA | 8 | 1 | Rezber |
| | JIDAYÎKBÛN Û BINEMALA HZ. PÊXEMBER (SILAVÊN XWEDA LÊ BIN) | 11 | 1 | Rezber |
| | QENCIYA BI DÊ Û BAV RE | 13 | 1 | Cotmeh |
| | HÎMÊN ISLAMÊ | 15 | 1 | Cotmeh |
| | DESTNIMÊJ | 18 | 1 | Cotmeh |
| | **BEŞA DUYEM:** | 21 | ..... | Cotmeh |
| | SÛRET EL-NAS | 22 | 1 | Cotmeh |
| | ZAROKTIYA PÊXEMBER (SILAVÊN XWEDA LÊ BIN) | 24 | 1 | Mijdar |
| | PÊŞENGTIYA QENC | 27 | 1 | Mijdar |
| | HÎMÊN BAWERIYÊ | 30 | 1 | Mijdar |
| | NIMÊJ | 33 | 1 | Mijdar |
| | **BEŞA SÊYEM** | 35 | .... | Berfanbar + Rêbendan |
| | SÛRET EL-`ELEQ | 36 | 1 | Berfanbar + Rêbendan |
| | JIYANA PÊXEMBER (SILAVÊN XWEDA LÊ BIN) BERIYA ŞANDEYÊ (KARÊ WÎ) | 38 | 2 | Berfanbar + Rêbendan |
| | QENCIYA BI CÎRANAN RE | 40 | 2 | Berfanbar + Rêbendan |
| Nirxandin û Navber | | | | Berfanbar + Rêbendan |
| Qonaxa Duyem | SAYA BIBÎRANÎNA XWEDAYÊ PAYEBILIND | 42 | 1 | Reşemeh |
| | ROJÎ | 44 | 1 | Reşemeh |
| | **BEŞA ÇAREM** | 47 | .... | Reşemeh |
| | SÛRET EL-ŞERH | 48 | 2 | Reşemeh |
| | JIYANA PÊXEMBER (SILAVÊN XWEDA LÊ BE) BERIYA ŞANDEYÊ (ROLA WÎ DI CIVAKÊ DE) | 50 | 1 | Adar |
| | RASTÎ (RASTGOTIN) | 53 | 1 | Adar |
| | ÇAKSINCÎ | 55 | 1 | Adar |
| | ZEKAT | 58 | 1 | Adar |
| | **BEŞA PÊNCEM** | 61 | .... | Cotmeh |
| | SÛRET EL-IXLAS | 62 | 1 | Cotmeh |
| | ŞANDEYA PÊXEMBER (SILAVÊN XWEDA LÊ BE) | 64 | 1 | Cotmeh |
| | ZIMANPARÊZÎ | 66 | 1 | Cotmeh |
| | DESTEPAKÎ (SPARTE) | 69 | 1 | Cotmeh |
| | HEC | 72 | 1 | Gulan |
| Nirxandin û Navber | | | | Gulan |


# Beşa yekem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Sûreta Fatîheyê bixwîne.
2. Rol û girîngiya Sûreta Fatîheyê nas bike.
3. Di sûretên Quranê û gotinên Pêxember (silavên Xweda lê bin) de, wateyên gotinên nû bide xuyakirin.
4. Binemala Pêxemberê rûmetdar û rola wî di civakê de, nas bike.
5. Ji dê û bavê xwe re qenc be û têkiliyeke baş û nerm bi wan re bike.
6. Hîmên islamê bihejmêre û sûdên her hîmekî nas bike.
7. Paqijya xwe ya kesayetî biparêze.
8. Nirxên ku di waneyan de bi wî re derbas dibin, bi rastiya jiyanê ve, girê bide.

# 1 Sûret El-Fatîha





**Qurana Pîroz, pirtûka Xwedayê payebilind e û pêwîst e her misilman wê bixwîne, jê hîn bibe û dema ku xwendina wê bibihîze bi baldarî, lê guhdarî bike.**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

بِسۡمِ ٱللَّهِ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلرَّحِيمِ ١ ٱلۡحَمۡدُ لِلَّهِ رَبِّ ٱلۡعَٰلَمِينَ ٢ ٱلرَّحۡمَٰنِ
ٱلرَّحِيمِ ٣ مَٰلِكِ يَوۡمِ ٱلدِّينِ ٤ إِيَّاكَ نَعۡبُدُ وَإِيَّاكَ نَسۡتَعِينُ ٥
ٱهۡدِنَا ٱلصِّرَٰطَ ٱلۡمُسۡتَقِيمَ ٦ صِرَٰطَ ٱلَّذِينَ أَنۡعَمۡتَ عَلَيۡهِمۡ غَيۡرِ ٱلۡمَغۡضُوبِ
عَلَيۡهِمۡ وَلَا ٱلضَّآلِّينَ ٧ الفاتحة [١-٧]

| | | | |
|---|---|---|---|
| الحمد | Pesn û spasî √ | Bexşandin ○ | Gunehkarî ○ |
| من أسماء الله التي توحي بتحقيق رحمته بعباده | Çavdêr û biker ○ | Dilovîn ○ | Zana ○ |
| نستعين | Peristinkirin ○ | Alîkariyê ji Xweda dixwazin ○ | Em bexşandinê dixwazin ○ |
| الصّراط | Nimêj ○ | Rêya xêrê ○ | Rojî ○ |

## Fêr bibim û bersivê bidim

Sûreta Fatîheyê li gel misilmanan ji sûretên naskirî ye. Xweda di her qameke ji qamên nimêjê de, xwendina wê li ser nimêjkeran ferz kiriye (sepandiye). Bi vê yekê Sûreta Fatîheyê hîmeke ji hîmên nimêjê ye.

◙ **Çima Sûreta Fatîheyê hîmekî bingehîn ê nimêjê ye?**

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

ٱهۡدِنَا ٱلصِّرَٰطَ ٱلۡمُسۡتَقِيمَ ﴿٦﴾ صِرَٰطَ ٱلَّذِينَ أَنۡعَمۡتَ عَلَيۡهِمۡ غَيۡرِ ٱلۡمَغۡضُوبِ
عَلَيۡهِمۡ وَلَا ٱلضَّآلِّينَ ﴿٧﴾ الفاتحة [٥-٧]

| | |
|---|---|
| اِهدِنَا | Ên dûrî rastiyê. |
| المَغضُوب عليهم | Rê nîşanî me bike. |
| الضَّالّين | Ên ku xwe ji rastiyê dane alî. |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Roja Axretê di destê Xweda de ye; ew bi tenê xwediyê roja hesab û sizayê ye.
- Tiştê herî mezin ê ku peristker ji Xweda dixwaze, ew e ku wî bîne ser rêya rastiyê.
- Ez xwe dispêrim Xweda û alîkariyê ji wî bi tenê dixwazim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ez ê bi malbata xwe re li ser girîngiya Sûreta Fatîheyê lêkolînê bikim.**

# 2 Jidayîkbûn û Binemala Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin)

## Bixwînim û bersivê bidim

Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) di nav gelê xwe de, ji hêla binemalê ve, ji kesên herî birûmet bû. Her weha ji hêla sincî û gewdeyî ve jî ji kesên herî gihiştî bû.

Ew Mihemed kurê Ebdulah kurê Ebdulmutelib kurê Haşim e. Li bajarê Mekayê, roja duşemê; 12`ê Rebî` El-Ewwel a sala Fîlê ji dayîk bûye. Hîn ew di zikê dayîka xwe de bû, bavê wî jiyana xwe ji dest daye. Dê û bavê wî ji êla qureyşê bûn û êla qureyşê weke benemal ji bilindtirîn êlên ereban bû.

| | |
|---|---|
| **Êla hezretê Pêxember** | Amîna keça Weheb |
| **Dayîka hezretê Pêxember** | Duşem 12 Rebî`El -Ewwel |
| **Jidayîkbûna hezretê Pêxember** | Qureyş |

## Fêr bibim û bersivê bidim

Pêxember (silavên Xweda lê bin) weke dilovanî ji cîhanê re hat şandin. Pêxember (silavên Xweda lê bin) ji kesayetên herî giranbuha yên ku bandor li mirovahiyê kiriye. Di nav pêxember û şanderên Xweda yên ku ew rê kirine de Hz. Mihemed, yê herî dawî bû. Xweda ew ji bo gihandina nameya ola islamê ji bo mirovan, hilbijart. Ew xwediyê sincekî pir bilind bû û di nava gelê xwe de, bi rastgotin û destepakiyê navdar bû.

- **Pêxember di nav gelê xwe de bi.......................... dihat nasîn.**
- **Ji navên Pêxember (silavên Xweda lê bin) ...................... , Mustefa û ......................**
- **Ji zarokên wî................., Fatîma,....................., Îbrahîm û...............................**

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Pêxemberê me yê rûmetdar weke dilovanî ji cîhanê re hat şandin.
- Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) ji hêla binemalê ve ji kesên herî birûmet bû. Ji hêla sincî û gewdeyî ve jî ji kesên herî gihiştî bû.
- Xweda, ew ji bo gihandina nameya islamê ji bo mirovan hilbijart.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ji bo qezenckirina agahiyên zêdetir di derbarê Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) de, ez ê bi malbata xwe re gotûbêjê bikim.**

# 3 Qenciya bi dê û bav re

Sinc

## Bixwînim û bersivê bidim

Ebû Hûreyra (Xweda jê razî be) got: Mêrek hat gel Pêxemberê Xweda û jê re got: "Ey pêxemberê Xweda kî ji mirovan bimaf e ku ez hogirtî û hevaltiya qenc bi wan re bikim?"
Pêxember got: "Dayîka te."
Mêr got: "Di pey wê re kî?"
Pêxember got: "Dayîka te."
Mêr Got: "Di pey wê re kî?"
Pêxember got: "Dayîka te."
Mêr got: "Di pey wê re kî?"
Pêxember got: "Di pey re bavê te."

**(Muslim)**

- **Weke ku di gotina Pêxember (silavên Xweda lê bin) de derbas bû, kî xwedî mafê hogirtiyê ye?**
- **Çima Pêxember (silavên Xweda lê bin) sê caran li ser dayîkê tekez kir?**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿وَٱعۡبُدُواْ ٱللَّهَ وَلَا تُشۡرِكُواْ بِهِۦ شَيۡـٔٗاۖ وَبِٱلۡوَٰلِدَيۡنِ إِحۡسَٰنٗا﴾ النساء: ٣٦

Xweda ferman daye ku em bi qencî û bi başî bi dê û bavê xwe re têkildar bibin û ev yek erkeke li ser milê her mirovî ye û her weha dixwaze:

**1. Peristina wî bikin.**
**2. ……………………...**
**3. ……………………...**

## Çalakî

قَالَ تَعَالَى:
﴿وَوَصَّيۡنَا ٱلۡإِنسَٰنَ بِوَٰلِدَيۡهِ حُسۡنٗاۖ﴾ العنكبوت [٨]

Em nîşana (√) li hemberî hevoka rast û nîşana (×) li hemberî hevoka şaş hêma bikin:

**1. Dengê xwe li hemberî dê û bavê xwe hilnadim.** ( )
**2. Di banglêkirinê de, navê dayîka xwe hildidim.** ( )

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Ez ê li hember dê û bavê xwe rêzdar bim û keda wan li ber çavan bigirim û bi taybet a dayîka xwe.
- Razîbûna Xweda bi qenciya ji dê û bav re girêdayî ye.
- Ez ê bi wan re, bi nermî biaxivim û ziyanê negihînim wan.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di derbarê têkiliya min bi dê û bavê min re, ez ê nivîsekê ku ne zêdeyî sê xêzan be, binivîsim.**

# Hîmên Islamê



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Kurê `Umer (Xweda ji wan razî be) got: Min dengê Pêxemberê Xweda bihîst ku wiha dibêje: Ola islamê li ser pênc hîman ava bûye: Anîna baweriya ku Xweda yek e û Mihemed pêxember û peristkerê Xweda ye, nimêjkirin, dana zikatê, çûna Hecê û rojîgirtina remezanê ye.

**(Buxarî û Muslim)**

**Hîmê yekê ji hîmên ola islamê .....................**
**Hîmê duyem nimêjkirin e.**
**Hîmê sêyem ................................**
**Hîmê çarem ................................**
**Hîmê pêncem rojîgirtina remezanê ye.**

## Ez encamê jê digirim

- **Xweda yek e û Hz. Mihemed pêxemberê wî ye:** Tekez dikim ku Xweda heye û yekta ye û ji bilî wî tu xwedayekî din tune ye. Her weha piştrast dikim ku Mihemed (silavên Xwedê lê be) pêxemberê Xweda ye.
- **Nimêjkirin:** Di demên wê de, pabendiya bi kirina nimêjê.
- **Dana zekatê:** Dana parekî ji malên xwe, ji bo kesên mafdar.
- **Hec (serdana mala Xweda):** Di mehên destnîşankirî de, serdana mizgefta Heramê ye. Ev yek li ser kesê hişmend, têgihiştî û li ser kesê xwedîkarîn, erk e.
- **Rojîgirtina remezanê**: Ew peristinek e ku derûniya mirov bi rêkûpêk dike û giyanî wî, bilind dike. Her weha ji hêla gewdweyî ve jî tendirust dike.

## Çalakî

Hîmên islamê bi awayekî pir xurt bi hev ve girêdayî ne; ev yek dihêle ku ew tev weke yek hêmanî bên diyarkirin û nabe ku dest ji yekî ji wan jî bê berdan.

| | |
|---|---|
| **Nimêj** | Li ser her misilmanê ku dikare, ferz e. |
| **Zekat** | Birêkûpêkiya derûniyê û fêrbûna xweragiriyê ye. |
| **Rojî** | Di navbera peristker û Xweda de, navgînek e. |
| **Hec** | Alîkariya xizan û mafdaran ne. |
| **Bawerî** | Bawerî bi Xweda û Pêxemberê wî ye. |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Hîmên ola islamê pênc in û ew bi hev ve girêdayî ne.
- Nimêj di rojê de li ser her mirovê misilman ê hişmend û gihiştî, pêncdem, ferz e.
- Rojî min fêrî xweragiriyê dike û her weha gewdeyê min xurt dike.

- Bi dana zekatê, alîkariya xizanan dibe û têkiliyên civakî xurt dibin.
- Hec (çûna Mala Xweda) carekê li ser her kesê ku dikare, ferz e.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ji bo naskirineke zêde, ez ê bi malabata xwe re di derbarê hîmên islamê de, gotûbêjê bikim.**

# 5 Destnimêj



## Fêr bibim û bersivê bidim

Pakbûn di islamê de xwedî nirxekî mezin e, divê her misilmanek di her dem û mercan de, vê yekê di ber çavan re derbas bike û pêk bîne. Islamê girîngî daye vî nirxî û ew di nava nirxan de, bilind kiriye; ew kiriye nîvê baweriyê weke ku di gotina Hz. Pêxember de, diyar dibe: "Pakbûn nîvê baweriyê ye." Di gel vê yekê de jî di nimêjê de, mercekî sereke ye; lewra nimêj bê pakbûnê nabe.

◙ **Çima islamê ewqas girîngî daye pakbûnê?**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُوٓاْ إِذَا قُمۡتُمۡ إِلَى ٱلصَّلَوٰةِ فَٱغۡسِلُواْ وُجُوهَكُمۡ وَأَيۡدِيَكُمۡ
إِلَى ٱلۡمَرَافِقِ وَٱمۡسَحُواْ بِرُءُوسِكُمۡ وَأَرۡجُلَكُمۡ إِلَى ٱلۡكَعۡبَيۡنِ﴾ المائدة [٦]

| **Rista Quranî** | **Wate** |
|---|---|
| ........................................................ | Şûştina rû û destan |
| ........................................................ | Mistdana serî û şûştina lingan |

## Ez encamê jê digirim

**Gavên destnimêjê:**

- Niyaza destnimêjê bigirim.
- Rûyê xwe bişom.
- Destên xwe heta enîşkê bişom.
- Mistdana serî.
- Lingên xwe heta gwîzekan bişom.

## Bixwînim û bersivê bidim

Pêxember (silavên Xweda lê bin) dibêje: Hûn dibînin ku li ber deriyê miroveki ji we, çemek hebe û her roj ew mirov pênc caran xwe jê bişo, wê tu qirêjiya wî bimîne? Gotin: Tu qirêjiya wî namîne! Pêxemberê Xweda got: Ew jî weke her pênc ferzên nimêjê ye; Xweda bi wan gunehê mirov dibexşîne.

◙ **Li gorî gotinên Pêxember (silavên Xweda lê bin) em ê çawa paqijiya xwe biparêzin?**

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Bi nimêja xwe ez paqijiya xwe diparêzim.
- Paqijiya min, baweriya min e.
- Paqijî di jiyana mirov û civakê de, xwedî girîngiyeke mezin e.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di derbarê girîngiya destnimêjê di paqijiya min a kesayetî de, ez ê bi malbata xwe re gotûbêjê bikim.**

# Beşa Duyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. **Sûreta Nasê bixwîne û wateya peyvên wê fêr bibe.**
2. **Diyar bike ku çima Sûret El-Nas bi vî navî hatiye binavkirin.**
3. **Şîrderên herî navdar ên ku Pêxember (silavên Xweda lê bin) şîr dane, nas bike.**
4. **Di sincê xwe de, Hz. Pêxember ji xwe re bike pêşeng.**
5. **Hîmên baweriyê bihejmêre û wateya giştî ya her hîmekî nas bike.**
6. **Girîngiya nimêjê ji bo kes û civakê nas bike.**
7. **Nirxên ku di waneyan de derbas dibin, bi rastiya jiyanê ve, girê bide.**

# 1 Sûret El-Nas

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

بِسۡمِ ٱللَّهِ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلرَّحِيمِ
﴿قُلۡ أَعُوذُ بِرَبِّ ٱلنَّاسِ ١ مَلِكِ ٱلنَّاسِ ٢ إِلَٰهِ ٱلنَّاسِ ٣ مِن شَرِّ
ٱلۡوَسۡوَاسِ ٱلۡخَنَّاسِ ٤ ٱلَّذِي يُوَسۡوِسُ فِي صُدُورِ ٱلنَّاسِ ٥ مِنَ
ٱلۡجِنَّةِ وَٱلنَّاسِ ٦﴾ [الناس ١-٦]

**أَعُوذُ**: Ez berê xwe didim Xweda û xwe pê diparêzim
**الْجِنَّةِ**: Cin

**Navê vê sûretê, Sûret El-Nas e, ji ber ku di piraniya ayetên wê de, peyva "nas"ê hatiye dubarekirin.**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:
﴿مِن شَرِّ ٱلۡوَسۡوَاسِ ٱلۡخَنَّاسِ ٤ ٱلَّذِي يُوَسۡوِسُ فِي صُدُورِ ٱلنَّاسِ
٥ مِنَ ٱلۡجِنَّةِ وَٱلنَّاسِ ٦﴾ [الناس ٤-٦]

| | |
|---|---|
| الخَنَّاس | Cin û mirov |
| يُوسوِس | Veşartî |
| الجِنَّةِ والنَّاس | Di dilan de sêwiran çêdike |

## Çalakî

- **Gotinên li jêr bixwînim û wan di valahiyên ristên Quranî yên li jêr wan in, bi cih bikim**

**مَلِكِ - أَعُوذُ – يُوَسْوِسُ – شَرِّ**

{قُلْ...... بِرَبِّ النَّاسِ (1) ...... النَّاسِ (2) إِلَهِ النَّاسِ (3) مِنْ...... الْوَسْوَاسِ الْخَنَّاسِ (4) الَّذِي...... فِي صُدُورِ النَّاسِ (5) مِنَ الْجِنَّةِ وَالنَّاسِ (6)}

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Xwedayê payebilind, xwedanê mirovan e û xwediyê her tiştî ye.
- Berê xwe didim Xweda û alîkariya wî ji bo dûrketina min ji her tiştên xerab ên ku sêwiran di derûniya min de çêdikin, dixwazim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi hevalên xwe re hin tiştên ku hestê ewlehiyê li gel min peyda dikin, lêkolîn bikim û wan di lênûsa xwe de binivîsim.**

# 2 Zaroktiya Pêxember (silavên Xweda lê bin)

## Fêr bibim û bersivê bidim

Zaroktiya Pêxember (silavên Xweda lê bin) yek ji qonaxên herî girîng ên jiyana wî bû. Di wê qonaxê de, gelek mizgînî û helwestên ku kesayeta wî tekûz kir, hebûn. Şîrdana wî, li gel dayîka wî Amîna keça Weheb dest pê kir. Hz. Pêxember piştre ji hêla jinek bi navê Suweyba ve hat şîrdan. Piştî wê bapîrê wî Ebdulmutelib, li jineke ku wî şîr bide, digere, lewra jinek ji benî Se`d ku navê wê Helîma El-Se`diya ye, wî şîr dide. Helîma El-Se`diya bi vê şîrdanê, rastî xêran hat. Di demê berê de, gelê Ereb ji bo zarokên wan di jîngeheke tendirust û saxlem de mezin bibin, ew dişandin biyabanê gel şîrderan û ev yek li gel wan weke çandeke navdar bû.

**Ereban, zarokên xwe ji bo şîrdanê dişandin biyabanê û dixwestin bi vê yekê, zarokên wan fêrî:**

**1. Xweşbêjiyê bibin.**

**2. ..............................**

**3. ..............................**

## Ez encamê jê digirim

- Yekemîn kesa ku piştî dayîka Pêxember (silavên Xweda lê bin) ew şîr daye, jineke ji qureyş e, navê wê Suweyba ye.
- Yek ji şîrderên herî navdar ên ku şîr dane Hz. Pêxember Halîma El- Se`diya ye û ew ji benî Se`d e.
- Halîma bi şîrdana Pêxember (silavên Xweda lê bin) rastî

xêran hat; beriya vê şîrdanê, ev xêr bi dest neketibûn.

- Pêxember (silavên Xweda lê bin) heta ku gihişt çar saliya xwe, li gel Helîma El-Se`diya ma.

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Piştî ku şîrdana Pêxember (silavên Xweda lê bin) li gel Halîma El-Se`diyayê bi dawî bû, ew du salan bi dayîka xwe re jiya. Dema ku ew bû şeş salî, dayîka wî jiyana xwe ji dest da. Bapîrê wî Ebdulmutelib ê ku di nav gelê xwe de pêşeng bû, xwedîkirina Pêxember (silavên Xweda lê bin) girte ser xwe. Di dilê wî de, cih û hezkirineke mezin ji Pêxember (silavên Xweda lê bin) re hebû, ji ber vê yekê wî ew nêzîkî xwe dikir û dilovanî raberî wî dikir. Her weha ji apên Pêxember (silavên Xweda lê bin) re digot: "Dev ji kurê min berdin, bi Xweda wê tiştekî mezin jê çêbibe". Lê vê xwedîkirinê dewam nekir, dema ku temenê Hz. Pêxember bû heşt sal, bapîrê wî Ebdulmutelib koça dawî kir.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Piştî mirina bapîrê wî Ebdulmutelib, ê ku Hz. Pêxember xwedî kir û xwedî lê derket** | Apê wî Ebû Leheb bû ○ | Apê wî El-Ebas bû ○ | Apê wî Ebû Talib bû (√) |
| **Dema ku bapîrê Hz. Pêxember Ebdulmutelib koça dawî kir, temenê Hz. Pêxember** | Çar salî bû ○ | Şeş salî bû ○ | Heşt salî bû ○ |

## Çalakî

Çawa ku bav xwedî li kurê xwe derdikeve û lê miqateye, Ebû Talib jî xwedî li Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) derdiket û lê miqate bû.

**Ji mînakên danûstendina Ebû Talib bi Pêxember (silavên Xweda lê bin) re**

↓

**Bêyî Hz. Pêxember di xew re nediçû.**

↓

**Di hemû rêwîtiyên xwe de Hz. Mihemed (silavên Xweda lê bin) bi xwe re dibir.**

↓

**.......................................**

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Pêxemberê Xweda ji zaroktiya xwe de, pîroz bû.
- Astengiyên ku li hember wî derketin, hêz û hedana wî zêde kirin.
- Di jiyana me de, ap û bapîr xwedî roleke mezin in.
- Jîngeheke dirust, şiyan û jêhatîbûnan bi pêş dixe.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ez ê bi mamosteyê xwe re, di derbarê rola jîngeha dirust di pêşxistina şiyanên hizrî û gewdeyî yên mirov de, gotûbêjê bikim û vê yekê di lênûsa xwe de binivîsim.**

# Pêşengtiya Qenc



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تعَالَى:
﴿لَّقَدْ كَانَ لَكُمْ فِي رَسُولِ ٱللَّهِ أُسْوَةٌ حَسَنَةٌ لِّمَن كَانَ يَرْجُوا۟ ٱللَّهَ وَٱلْيَوْمَ ٱلْـَٔاخِرَ وَذَكَرَ
ٱللَّهَ كَثِيرًا ﴿٢١﴾﴾ الأحزاب [٢١]

- **Li gorî têgihiştina te, pêşengtiya qenc çi ye?**
- **Divê ez di jiyana xwe de, kê weke pêşeng ji xwe re hilbijêrim?**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxember (silavên Xweda lê bin) di têkiliyên civakî de, xwedî sincekî bilind, hişmendiyeke fireh û hezkirineke mezin bû. Wî bi pêşengtiya qenc û bi peyva xweş, bang ji bo sincên bilind kir.

**Pêxember (silavên Xweda lê bin) di nav mirovan de, pêşengtiya qenc di xwe de pêk tanî, di rêya:**

1. **Xwe di ser mirovên derdora xwe re, nedidît.**
2. **Bi mirovên derdora xwe re, şahî û şînên wan parve dikir.**
3. **.......................................................................**

## Ez encamê jê digirim

- Pêşengtiya Qenc: Mirov bi kesayeteke erênî û bisinc bandor bibe û her weha wê bişopîne û sûdê jê bigire.
- Divê ku em mirovên erênî yên xwedî taybetiyên baş, weke pêşeng bigirin dest û xwe ji mirovên neyînî û nebaş, dûr bixin.

## Çalakî

Her  ku em kesên dirust û erênî weke pêşeng ji xwe re bigirin dest, em ê di jiyana xwe de, nêzî serkeftinê bibin.

**Ji berhemên pêşengtiya qenc**

↓

Belavbûna paksinciyê

↓

...................................

↓

...............................

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Hezretê Pêxember (silavên Xweda lê bin), pêşeng û nimûneya min a dirust e.
- Ez mirovên xwedî sincên baş, weke pêşeng digirim dest.
- Ez bi rêya sinc û karê xwe, xwe wek pêşeng diyar bikim da ku mirov jî min weke nimûneyekî baş bigirin dest.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di derbarê sûdên şopandina kesên dirust ji bo civakê de, ez ê nivîsekê ku sê xêzan derbas neke, binivîsim.**

# 4 Hîmên Baweriyê

Gotinên Pêxember




## Guhdarî bikim û bersivê bidim

`Umer Bin El-Xetab (Xweda jê razî be) got: "Cibrîl ji Hz. Pêxember pirsî: "Bawerî çi ye?" Pêxember got: "Tu baweriya xwe bi Xweda, firişteyên wî, pirtûk û şanderên wî, bi Roja Axretê û narvînê; xêr û şerê wê, bînî."

- **Bawerî:** Ew gotina bi ziman, baweriya bi dil û karkirina bi lebatan e.
- **Baweriya bi Xweda:** Tu bawer bikî ku Xweda yek e û tu hevparan (şirîkan) jê re çênekî.
- **Ferman û narvîn:** Vîna Xwedayê payebilind e.

◙ **Cibrîl çi ji Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) pirsî?**
◙ **Hîmên baweriyê çi ne?**

## Çalakî

Hîmên baweriyê şeş in, ew bi hev ve girêdayî ne û heke bawerî bi hemû hîman neyê kirin, bawerî dirust nabe.

| | |
|---|---|
| **Baweriya bi Xweda** | Şanderên ku Xwedayê payebilind ew ji bo rênîşanda mirovan, hilbijartine. |
| **Baweriya bi firişteyan** | Pirtûkên esmanî yên ku Xweda ji şanderên xwe re anîne xwarê. |
| **Baweriya bi pirtûkên esmanî** | Afrîdeyên bironî yên ku fermanên Xweda tu carî binpê nakin. |
| **Baweriya bi pêxemberan** | Baweriya tekûz bi yektabûna Xweda û nebûna tu hevparan jê re. |
| **Baweriya bi Roja Axretê** | Tiştên ku ji mirov re, hatine nivîsîn û narvîna wî ye, rastî wan tê. |
| **Baweriya bi ferman û narvîna Xweda** | Roja Axretê |

## Çalakî

| Ji pirtûkên esmanî | Ji pêxemberên Xweda | Ji firişteyan |
|---|---|---|
| Tewrat | Mûsa | Cibrîl |
| ....... | ....... | ....... |
| ...... | ...... | ...... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Bawerî: Gotin, kiryar û niyaz e.
- Ji hemû pêxember û şanderên Xweda, hez dikim.
- Ji hemû ol û pirtûkên esmanî re, rêzê digirim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di derbarê girîngiya rêzgirtina hemû olên din de, bi mamosteyê xwe re gotûbêjê bikim û vê yekê ez ê di lênûsa xwe de binivîsim.**

# 5 Nimêj

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Nimêj, hîmeke ji hîmên ola islamê ye. Her weha nimêj bingehekî resen e û ji girîngtirîn peristinan e; weke di gotina Hz. Pêxember de jî derbas dibe: Serê vê yekê Islam e û stûna wê jî nimêj e.

- **Pêxember, di gotina xwe de nimêj bi çi nimandiye?**
- **Çima ev nav li nimêjê hatiye kirin?**

## Fêr bibim û bersivê bidim

Nimêjên ku di rojê de (şev û roj) li ser kesê misilman hatine ferzkirin; pênc nimêj in: nimêja sibehê, nimêja nîvro, nimêja `esrê, nimêja mexribê û nimêja `eşayê.

- **Nimêja sibehê du qam in.**
- **Nimêja nîvro......................**
- **Nimêja `esrê ......................**
- **Nimêja mexribê sê qam in.**
- **Nimêja `eşayê......................**
- **Hejmara tevahiya qamên nimêjê yên roj û şevê ......................qam in.**

## Çalakî

Ji ber bandorên nimêjê yên xurt li misilman û civaka wî, nimêj di jiyana mirovê misilman de, xwedî roleke girîng e.

| | |
|---|---|
| **Hevnaskirina mirovan ji hev re** | → Bandorên civakî |
| **Aramîbûn û hestê** | → ............................ |
| **Peywendiya peristker û Xweda zêde dibe** | → Bandorên kesayetî |
| **Pevgirêdana dilan** | → ............................ |
| **Rêkûpêkirina sincan** | → ............................ |
| **Parastina paqijiya kesayetî** | → ............................ |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Nimêj yek ji hîmên herî girîng ên ola islamê ye.
- Bi pabendî nimêjê di dema wê de dikim.
- Nimêj li ser kes û civakê xwedî roleke girîng û erênî ye.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Her misilman hewl dide ku pabendiyê bi nimêja xwe bike. Sedemên ku wî ber bi vê yekê ve dibin, bi sê xêzan binivîsim.**

## Beşa sêyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Sûreta`eleqê bixwîne û wateyên peyvên wê fêr bibe.
2. Di jiyana mirovan de, girîngiya zanist û zanebûnê nas bike.
3. Karên herî girîng ên ku Hz.Pêxember (silavên Xweda lê bin) beriya şandeyê kirine, nas bike.
4. Di xweşpêkanîna kar û dilsoziya wî de, Hz. Pêxember weke pêşeng ji xwe re bibîne.
5. Girîngiya kar a ji bo mirov û civakê tê bigihêje.
6. Di danûstandina bi cîranan re, rêzdariyê nîşan bide.
7. Fêrî sayên bibîranîna Xweda bibe.
8. Wateya rojiyê û sûdên wê nas bike.
9. Nirxên ku di waneyan de derbas dibin, bi rastiya jiyanê ve girê bide.

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:
﴿ٱقۡرَأۡ بِٱسۡمِ رَبِّكَ ٱلَّذِى خَلَقَ ① خَلَقَ ٱلۡإِنسَٰنَ مِنۡ عَلَقٍ ② ٱقۡرَأۡ وَرَبُّكَ ٱلۡأَكۡرَمُ
③ ٱلَّذِى عَلَّمَ بِٱلۡقَلَمِ ④ عَلَّمَ ٱلۡإِنسَٰنَ مَا لَمۡ يَعۡلَمۡ ⑤﴾ العلق [١-٥]

* **عَلَقٍ:** Pêvajoyeke ji pêvajoyên afirandina mirov e
* **الْأَكْرَمُ:** Ê ku bi afrîdeyên xwe re, yê herî merd e

**Sûret El-`eleq, sûreta yekem e ku li ser Hz. Pêxember hatiye daxistin.**

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Gava Pêxember (silavên Xweda lê bin) di şikefta Hîrayê de, peristin dikir, Cibrîl daket ser wî û jê re got: Bixwîne! Pêxember got: Ez nexwenda me! Cibrîl got: Bixwîne! Pêxeber (silavên Xweda lê bin) got: Ez nexwenda me! Cibrîl wiha got:

اِقرَأْ بِاسمِ رَبِّكَ الَّذي خَلَقَ، خَلَقَ الإنسَانَ مِن عَلَقٍ...

- **Pêxember (silavên Xweda lê bin) beriya ku sirûş (wehî) dakeve ser, li ku derê peristin dikir?**
- **Yekemîn ferman ku Xwedayê payebilind li Pêxemberê xwe kir, çi bû?**
- **Di ayeta pîroz de, dubarekirina Cibrîl ji fermana xwendinê re, çi nîşan dide?**

## Çalakî

| Ji alavên nivîsa kevn | Ji alavên nivîsa nûjen |
| --- | --- |
| Perîk | Pênûs |
| Ximava ron | ......... |
| ......... | ......... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Di zanînê de, Pêxember (silavên Xweda lê bin) weke pêşeng bibînim.
- Zanist rêya min ronî dike û min dike mirovekî serkeftî.
- Zanebûna mirov a ji xwendin û nivîsê re, belavbûna nezaniyê sînordar kir.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Rêbazên nûjen ên bidestxistina agahiyan, cihêreng in, di derbarê vê mijarê de, nivîseke ku sê xêzan derbas neke, binivîsim.**

# 2 Jiyana Pêxember beriya şandeyê (karê wî)

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxember di destpêka ciwantiya xwe de, karê şivantiyê dikir û ev pîşe jî weke pîşeya çend pêxemberên beriya Hz. Mihemmed bû. Hz. Pêxember ji bo alîkariya apê xwe Ebî Talib bike, şivantiya pezê wî dikir. Paşê Hz. Pêxember beranberî kiryeke destnîşankirî ku ji mirovên Mekayê werdigirt, şivantiya wan dikir. Her weha ji bilî karê şivantiyê, wî bi Xedîce xanim re (xwedê jê razî be) piştî ku wê ew hilbijart, kar dikir.

- **Ji taybetiyên ku pîşeya şivantiya pez di derûniya mirov de diçîne:**
  **1. Xweragirtin (sebir).**
  **2. Dilnizmî.**
  **3. ............**
  **4. . ............**
- **Çima Xedîce xanim (xwedê jê razî be) Pêxemberê Xweda hilbijart ku pê re kar bike?**
- **Hz. Mihemed (silavên Xweda lê bin) bi Xedîce xanim (xwedê jê razî be) re çi kar dikir?**

## Ez encamê jê digirim

- Pîşeya şivantiyê, yek ji wan pîşeyan e ku piraniya pêxemberan ew kiriye.
- Pêxember (silavên Xweda lê bin) jî wek kesên din ên nifşê xwe, xortekî bihêz bû û dixwest debara jiyana xwe bi xwêdana eniya xwe peyda bike.

- Hz. Pêxember, rast bû û siparte diparast û di karê xwe de şareza bû.

## Fêr bibim û bersivê bidim

Civaka bihêz tenê bi endamên xwe bi hêz dibe û bi lawaziya wan lawaz dibe. Ji ber vê yekê, di jiyana mirovan de, kar xwedî girîngiyeke mezin e. Ola islamê, cihekî berz daye kar; kar rûmet û payebilindiyê dide xwediyê xwe. Her weha bêkarî û negirtina bergiriyan, qedexe kiriye. Bêkarî ziyanê dide kes û civakê û gendeliyê derbasî nava civakê dike.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Girîngiya kar ji bo mirov** | → | Berhênana karînan | Qezenckirina Heyberî (madî) | .......... |
| **Girîngiya kar ji bo civakê** | → | Bihêzkirina aboriyê | Hevgirtina civakê | .......... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Ez, Hz. Pêxember di şarezayî û dilsoziya wî ya di kar de, weke pêşeng bibînim.
- Hewl bidim ku di civaka xwe de, mirovekî baş bim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi malbata xwe re di derbarê girîngiya kar di jiyana mirov de, gotûbêjê bikim û vê mijarê bi nivîseke ku çar xêzan derbas neke, binivîsim.**

# 3 Qenciya bi cîranan re

Sinc

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: Cibrîl hîn jî temîniya cîran li min dike, heta min guman kir ku wê cîran bike paşmayîgirê cîranê xwe.

- **Çima Cibrîl temîniya cîranan li Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) kiriye?**
- **Ji mînakên danûstandina Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) bi cîranên xwe re:**

**1. Alîkarî pêşkêşî wan dikir.**
**2. Di rûyê wan de, rûken bû.**
**3. .....................................**
**4. .....................................**

## Ez encamê jê digirim

Cîranê min, ew kesê ku mala wî nêzîkî mala min e, çi misilman be, çi ne misilman be. Ola islamê me ber bi wê yekê ve dibe ku em bi nirx û rêzdarî danûsandinê bi cîranên xwe re bikin. Ji ber ku bipêşketina civakê, hevgirêdan û belavkirina hezkirinê di nav endamên wê de, ne bi vê yekê be, pêk nayê.

## Çalakî

Qenciya bi cîranan re, navgîneke pêşketina civakê ye. Her weha girêdanên ku di navbera endamên wê de hene, bi hêz dike. Ji ber vê yekê, divê her yek ji me, maf û erkên xwe li hemberî cîranên xwe nas bike.

**Ji mafê cîranan**

↓

Silavdayîn

↓

....................................

↓

................................

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Danûstandinên Hz. Pêxember ên baş bi cîranên wî re, weke nimûne bibînim.
- Ji her tiştên ku ziyanê didin cîranên min, dûr bikevim.
- Şahî û şînên cîranan bi wan re, parve bikim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Li hember hevalên xwe, dabaşa rewşek ku min tê de alîkariya cîranekî xwe kiriye, bikim û em vê yekî gotûbêj bikin.**

# 4 Saya bibîranîna Xwedayê payebilind



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Ebû Mûsa El-Eş`erî; Xweda jê razî be got: Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: Kesê ku Xweda bi bîr tîne û kesê ku Xweda bi bîr nayne, mîna kesê sax û mirî ye.

**(Buxarî)**

- **Pêxember (silavên Xweda lê bin) kesê ku Xweda bi bîr tîne û kesê ku wî bi bîr nayne, bi çi nimandiye?**
- **Hin ji bibîranînên rewa:**

**1. Daxwaza lêborînê ji Xweda.**
**2. Silavkirina li Pêxember (silavên Xweda lê bin)**
**3. ..........................**
**4. ..........................**

## Çalakî

Bibîranîna Xwedayê payebilind di hundirê mirov de, nihad zindî dike. Ev yek dihêle ku mirov ji xwe û ji civaka xwe re, dirust be. Bibîranîna Xweda li gel lebata zimên sînordar nabe.

| | |
|---|---|
| **Bibîranîna bi ziman** | Hizrandin di razên afrîdeyan û gerdûnê. |
| **Bibîranîna bi dil** | Peristin û kar |
| **Bibîranîna bi hemû lebatan** → Peristin û kar | Pesn û lêborîn |

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ وَتَطۡمَئِنُّ قُلُوبُهُم بِذِكۡرِ ٱللَّهِۗ أَلَا بِذِكۡرِ ٱللَّهِ تَطۡمَئِنُّ ٱلۡقُلُوبُ ٢٨﴾

الرعد [٢٨]

**Bibîranînên herî zêde ku Xweda ji wan hez dike.** →

| | | |
|---|---|---|
| سبحان الله | .......... | .......... |

**Ji bibîranînên ku Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) ew vegotine.** →

| | | |
|---|---|---|
| أصبحنا وأصبح المُلكُ لله | .......... | .......... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Ez Xwedayê xwe bi bîr tînim da ku dilê xwe aram bikim.
- Bibîranîna Xweda, nihadê mirov zindî dike û qenciyê li gel wî zêde dike.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi hevalên xwe re dabaşa hin bibîranînên ku ez wan vedibêjim, bikim, paşê wan di lênûsa xwe de binivîsim.**

# Rojî

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ كُتِبَ عَلَيۡكُمُ ٱلصِّيَامُ كَمَا كُتِبَ عَلَى ٱلَّذِينَ مِن
قَبۡلِكُمۡ لَعَلَّكُمۡ تَتَّقُونَ ١٨٣﴾ البقرة [١٨٣]

**كُتِبَ:** Ferz bûye.
**تَتَّقُونَ:** Hûn bi fermana Xweda dikin û ji gunehkariyê dûr dikevin.

- **Li gorî têgihaştina te, rojî tê çi wateyê?**
- **Di rojê de, mirov kengî dest bi rojiyê dike?**

## Ez encamê jê digirim

**Rojî:** Bi niyaza peristina Xwedayê payebilind, ji berbanga sibê heta rok diçe ava, mirov xwe ji hemû cureyên xwarin û vexwarinê dûr dixe. Rojî hîmekî ji hîmên ola islamê ye. Ev peristin, Xweda li ser me û li ser gelên beriya islamê jî ferz kiriye. Ev peristin bi mebesta çandina xêrê di derûniya mirov de, xweragitin û zêdekirina şiyana xêrê li gel me, hatiye ferzkirin.

## Çalakî

Xwedayê payebilind, rojî ji bo berjewendiya mirovan ferz kiriye; bandor û sûdên rojîgirtinê yên perwerdehî (perwerdeya derûnî) û yê gewdeyî, pir in.

**Sûdên rojîgirtinê yên tendirustî**

↓

Şaneyên laş nû dike

↓

................................

↓

.............................

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxemberê Xweda (silavên Xweda lê bin) got: "Hin rojîgir hene, ji rojiya xwe ji bilî birçîbûnê, tu tiştekî din, bi dest naxin."

Rojî, ne tenê xwe qutkirina ji xwarin û vexwarinê ye; divê em çavdêriya xwe bikin û ji her tiştên ku ziyanê didin kesên din, dûr bikevin û hewl bidin ku em alîkariya xizan û belengazan bikin.

| Bandorên rojîgirtinê | Li ser mirov | Li ser civakê |
|---|---|---|
| **1. Vîn û karînê xurt dike.**<br>**2. Dilovanî û biratiyê zêde dike.**<br>**3. Mirov fêrî xweragirtinê dike.**<br>**4. Hevgirtin û alîkariyê pêk tîne.**<br>**5. Derûniyê perwerde dike.**<br>**6. Alîkariya belengazan tê kirin.** | 1. Mirov fêrî xweragirtinê dike.<br>2. ...................<br>3. ................... | 1. Alîkariya belengazan tê kirin.<br>2. ...................<br>3. ................... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Ji bo ku vîna qenciyê li gel me xurt bibe, Xweda rojîgirtin li ser me ferz kiriye.
- Rojî ji bo laş hêz e û ji bo derûniyê perwerde ye.
- Destê alîkariyê dirêjî xizan û belengazan bibe.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di derbarê xêrên meha Rojiyê de, bi hevalên xwe re, gotûbêjê bikim û nivîseke ku ne zêdeyî sê xêzan be, binivîsim.**

## Beşa çarem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. **Sûreta Şerhê bixwîne û wateyên peyvan fêr bibe.**
2. **Rolên civakî yên ku Pêxember bi wan rabûye, nas bike.**
3. **Girîngiya hevgirtina civakî ya di navbera mirovan de, tê bigihêje.**
4. **Her gav di gotin û kiryarên xwe de, li rastiyê bigere.**
5. **Xwedî sincekî baş be û ziyanê negihîne kesên din.**
6. **Wateya zekatê û bandorên wê li ser kes û civakê, nas bike.**
7. **Nirxên ku di waneyê de derbas dibin, bi rastiya jiyanê ve girê bide.**

## 1 Sûret El-Şerh

### Guhdarî bikim û bersivê bidim

بِسۡمِ ٱللَّهِ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلرَّحِيمِ

أَلَمۡ نَشۡرَحۡ لَكَ صَدۡرَكَ ١ وَوَضَعۡنَا عَنكَ وِزۡرَكَ ٢ ٱلَّذِيٓ أَنقَضَ ظَهۡرَكَ ٣
وَرَفَعۡنَا لَكَ ذِكۡرَكَ ٤ فَإِنَّ مَعَ ٱلۡعُسۡرِ يُسۡرًا ٥ إِنَّ مَعَ ٱلۡعُسۡرِ يُسۡرًا ٦ فَإِذَا فَرَغۡتَ فَٱنصَبۡ ٧ وَإِلَىٰ
رَبِّكَ فَٱرۡغَب ٨ الشرح [١-٨]

- **Xwedayê payebilind di ayetan de, bi kê re diaxive?**
- **Çima Xwedayê payebilind gotina (إِنَّ مَعَ الْعُسْرِ يُسْرًا) dubare kiriye?**
- **Em peyvên di tabloya yekem de û wateyên wan di tabloya duyem de, bigihînin hev:**

| | |
|---|---|
| نَشرَحُ | Giran kir |
| وَضعنَا | Gunehên te |
| وِزرك | Berê xwe bidim |
| أَنقَضَ | Rabe, peristinê bike |
| اِرغَب | Me sînga te fireh kiriye |
| انصَب | Me rakir |

(وِزرك → Gunehên te)

## Ez encamê jê digirim

Sûreta Şerhê, xweşiyên ku Xwedayê payebilind dane Pêxemberê xwe, diyar dike; Xwedayê payebilind sînga wî ji şerî`et, maf, pend, zanîn û dozê re, fireh kiriye.

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Aramiya dilan bi xweragitinê çêdibe.
- Her ku gunehên mirov kêm bin, ewqas dilxweşiya wî zêde dibe.
- Li pey her tengasiyekê, firehiyek heye.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ez ê bi malbata xwe re li sedema binavkirina vê sûretê bi Sûreta Şerhê lêkolîn bikim û di lênûsa xwe de binivîsim.**

# 2 Jiyana Pêxember (silavên Xweda lê bin) beriya şandeyê (rola wî di civakê de)



## Fêr bibim û bersivê bidim

Ke`be, avahiyeke kabikî ye; hemû aliyên wê hema bêje çargoşeyî ne. Cara pêşîn ji aliyê hezretê Ibrahîm bi alîkariya kurê wî hezretê Ismaîl ve, hat avakirin. Dema ku qureyşê xwest, Ke`beyê ji nû ve ava bike, di navbera serwerên Mekayê de, nakokî derket. Her yekî ji wan dixwest ku rûmeta danîna Kevirê Reş (kevirekî giranbuha ye) di cihê wî yê destnîşankirî de, bi dest bixe. Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) ev nakokî bi raxistina şalika xwe û danîna Kevirê Reş li ser wê, çareser kir. Paşê Hz. Pêxember ji her yekî ji wan xwest ku aliyekî şalikê bigire da ku bi hev re kevir bilind bikin, lewra Pêxember kevir bi cih kir û paşê wan avakirina Ke`beyê temam kir.

- **Çima di dema jinûveavakirina Ke`beyê de, nakokî di navbera serwerên qureyşê de, derket?**
- **Pêxember (silavên Xweda lê bin) çawa serwerên qureyşê razî kir û nakokiya di navbera wan de çare kir?**

## Ez encamê jê digirim

Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) li Mekayê di çarekirina nakokiya ku di derbarê jinûveavakirina Ke`beyê derketibû, de beşdar bû.


Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) beriya şandeyê piştgirtiya hemû çalakiyên sincî dikir. Weke mînak “Hilf El-Fidûl” a ku tê de êlan li hev kiribû ku piştgirtiya bindestan û parastina lawazan

bikin, lewra Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: "Min di mala Ebdulah Bin Ced`an de peymanek dît … Heger di islamê de, weke wê peymanê li dar bikeve û ez bême vexwendin, ez ê bipejirînim."

## Çalakî

Pêxember (silavên Xweda lê bin) doza sincên herî qenc û bilind dikir. Mînak: Doz rastgotin, parastina sparteyê, qenciya bi dê û bav re, danûstandina bi xizman re û cîrantiya baş. Her weha bawerî û çandên xerab, kirêt didît.

**Mînak:** Tolhildan û destdirêjiya li ser kes, mal û mewdanên kesên din.



## Ez ji waneyê fêr bibim

- Bi mirovên  gund û bajarê xwe re, hevkariyê bikim.
- Bi hemû mirovan re, dilnizim bim û xwe di ser wan re nebînim.
- Kesên bindest, lawaz û belengaz biparêzim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi malbata xwe re di derbarê girîngiya hevkariya di navbera mirovan de, gotûbêjê bikim û bi nivîseke ku sê xêzan derbas neke, binivîsim.**

# 3 Rastî (Rastgotin)

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxemberê Xweda (silavên Xweda lê bin) got: "Mirov (mêr) hîn rast dipeyive û li rastiyê digere, heta li gel Xweda wekî mirovekî rastgo tê nivîsîn. Mirov hîn derewan dike û li xwariyê digere, heta li gel Xweda wekî mirovekî derewîn tê nivîsîn."

**(Buxarî û Musilm)**

- **Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) me vedixwîne çi?**
- **Pêxember (silavên Xweda lê bin) me ji çi dûr dixe?**
- **Li gel Xweda, xelata kesê rastgo, çi ye?**

## Ez encamê jê digirim

- Rastî: Gotina rastiyê ye û bi kar re lihevhatin e.
- Rastî, yek ji wan taybetiyên herî girîng e ku divê li gel kesê misilman hebe.
- Rastî, taybetiyeke bingehîn a pêxember û şanderan e.
- Rastî, di nava xwe de, gotin û kirinê dihundirîne.

## Çalakî

Rastî, yek ji nirxên rûmetdar e ku bandorên baş li mirov û civakê dike. Rastî mîna hemî nirxên din, xwedî gelek awayan e; ew di karên ku mirov pê radibe alîkariya serkeftina wî, dike.

| | |
|---|---|
| **Rastiya bi Xweda re** | Rastî di kirîn û firotinê de û şarezabûna di kar de. |
| **Rastiya bi mirovan re** | Hemû karan ji bo Xweda dike. |
| **Rastiya di têkiliyan de** | Mirov xwe bixwe nexapîne. |
| **Rastiya bi xwe re** | Di axaftina xwe de, derewan li kesên din nake. |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Rastî, ji bo sincên baş, dergehê yekem e.
- Di gotin û kirinên xwe de, her dem li rastiyê bigerim.
- Rastî, min di hemû astan de, dike mirovekî serkeftî.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di pevgirêdana ku di navbera mirovan de çêdibe, rastî xwedî roleke girîng e. Di derbarê vê mijarê de, nivîsekê ku sê xêzan derbas neke, binivîsim.**

# Çaksincî



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Mu`az Bin Cebel (Xweda jê razî be) got: Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: Tu li ku derê bî, xwedatirs be û heke tu ketî gunehkariyê, li pey wê qenciyê bike, ew qencî gunehê radike û bi sincekî baş, têkiliyê bi mirovan re bike.

**(Buxarî û Muslim)**

◙ **Pêxember (silavên Xweda lê bin) di destpêka gotina xwe de, çi ferman li me kiriye?**

◙ **Wateya vê nivîsê çi ye?**

**"Heke tu ketî gunehkariyê, li pey wê qenciyê bike, ew qencî gunehê radike".**

## Fêr bibim û bersivê bidim

Xwedatirsî, tê wateya, mirov bi fermana Xweda bike û ji tiştên ku qedexe kiriye, dûr bikeve.

Divê kesê misilman, xerabiyê bi qenciyê vegerîne û guneh bi kirina xêrê ji ser xwe rake û her gav li xêrê bigere.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Ji taybetiyên mirovê bisinc** | → | Aramî | .......... | .......... |
| **Ji awayên xwedatirsiyê** | → | Alîkariya lawazan | .......... | .......... |

## Çalakî

قَالَ تَعَالَى:

﴿وَإِنَّكَ لَعَلَىٰ خُلُقٍ عَظِيمٍ ﴿٤﴾﴾ [القلم ٤]

Xwedayê payebilind, nirxên çaksinciyê diyar kiriye û berê me dide wê yekê ku em Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) weke pêşeng bibînin û bişopînin.

| | |
|---|---|
| **Ez sibehê derbasî polê bûm û min hevalên xwe li pêşberî xwe dîtin.** | Ez ê spasiya wî bikim. |
| **Hevalê min nexweş ket û nehat dibistanê.** | Ez ê silavê li wan bikim. |
| **Bavê min cilên nû ji min re anîn.** | Ez ê destûra dê û bavê xwe bixwazim û serdana wî bikim. |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Pêxember (silavên Xweda lê bin) ji aliyê sincî ve, weke pêşeng bibînim û bişopînim.
- Xerabiyê bi qenciyê vegerînim.
- Çaksinciyê, di gotin û kirinên xwe de, pêk bînim.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ji hevalên xwe re, dabaşa du nimûneyên têkiliyên baş bikim û di derbarê vê mijarê de, gotûbêjê bikim.**

# 5 Zekat



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿وَأَقِيمُوا۟ ٱلصَّلَوٰةَ وَءَاتُوا۟ ٱلزَّكَوٰةَ وَٱرْكَعُوا۟ مَعَ ٱلرَّٰكِعِينَ ۝٤٣﴾ البقرة [٤٣]

- **Di derbarê zekatê de, têgihiştina te, çi ye?**
- **Di nêrîna te de, çima em zekatê derdixin?**
- **Li gorî ayeta li jor, zekat bi çi ve hatiye girêdan?**

## Ez encamê jê digirim

Di islamê de, zekat weke hîmekî bingehîn tê dîtin. Ew sedeqeyeke Ku Xwedayê payebilind, misilman pê pabend kirine. Ev zekat li ser kesên xwedîkarîn tê ferzkirin û ev zekat ji bo kesên xizan, lawaz û mafdar, tê dayîn.

## Çalakî

**Ji sûdên zekatê:** Mal zêde dibe, xizanî namîne û di civakê de, hevgirtin û piştgirtiyê xurt dike.

**Ji bandorên zekatê li ser mirov:**

↓

Di giyan de dilovaniyê diçîne.

↓

........

↓

........

**Ji bandorên zekatê li ser civakê :**

↓

Di nava endamên civakê de, hezkirin û hevgirtinê pêk tîne.

↓

........

↓

........

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Zekat giyanê min ji ezezîtî û çavbirçîtiyê pak dike.
- Alîkariya hevalên xwe yên ku pêwîstiya wan bi alîkariyê heye, dikim.
- Zekat, di nav endamên civakê de, hezkirinê pêk tîne.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi malbata xwe re, di derbarê zekatê de û rola wê ya di têkçûna xizaniyê di gund û bajarê xwe de, gotûbêj bikim û vê yekê, di lênûsa xwe de binivîsim.**



# Beşa pêncem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Sûreta Ixlasê bixwîne û wateya peyvên wê fêr bibe.
2. Tê bigihêje ku Pêxember (silavên Xweda lê bin) wekî dilovaniyekê ji cîhanê re hatiye şandin.
3. Girîngiya zimanparêziyê nas bike û çavdêriya gotinên xwe, bike.
4. Di jiyana xwe ya rojane de, nirxê sparteyê nas bike.
5. Wateya Hecê û cihê wê di dilê misilmanan de, nas bike.
6. Nirxên ku di waneyan de derbas dibin, bi rastiya jiyanê ve girê bide.

# 1 Sûret El-Ixlas

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

بِسۡمِ ٱللَّهِ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلرَّحِيمِ

﴿قُلۡ هُوَ ٱللَّهُ أَحَدٌ ١ ٱللَّهُ ٱلصَّمَدُ ٢ لَمۡ يَلِدۡ وَلَمۡ يُولَدۡ ٣ وَلَمۡ يَكُن لَّهُۥ كُفُوًا
أَحَدُۢ ٤﴾ الإخلاص [١-٤]

**أَحَدٌ** : Yek e (bi tenê ye)
**الصَّمَدُ** : Ê ku afrîde xwe lê digirin.
**كُفُوًا**: Hempa

- **Afrînerê her tiştî kî ye?**
- **Du taybetiyên Xwedayê payebilind ên ku di sûreta pîroz de, derbas bûne, bibêje.**

## Ez encamê jê digirim

Xweda yek e, hevparê (şerîk) wî tune ye û pêwîstiya wî bi tu kesî tune ye. Tu kes mîna wî tune ye. Jê re kur, keç, dê û bav tune ne û her dem afrîde xwe lê digirin.

## Çalakî

Xweda tiştên ku qet me nizanîbûn, hînî me kiriye. Her weha jî hiş afirand da ku em di mezinahiya wî de bihizirin.

* **Xweda................hevpar (şerîk) jê re tune ye.**
* **Kes mîna wî................**
* **Ji Xweda pê ve tu xwedawend tune ne.**
* **Ji wî re................**
* **Em her gav bi lavayan  berên xwe didin Xweda.**

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Xwedayê min yek e û tu hevparê wî tune ye.
- Di lavayên xwe de, tenê berê xwe didim Xweda.
- Xweda bêkêmanî ye; tu şerm û kêmanî tê de, peyda nabin.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Ji xweşiyên ku Xweda daye me, xweşiya mejî ye. Bi hevalên xwe re, ez ê vê yekê gotûbêj bikim û di lênûsa xwe de, binivîsim.**

2

# Şandeya Pêxember (silavên Xweda lê bin)



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Piştî ku Cibrîl Sûret `eleqê daxist ser Pêxember (silavên Xweda lê bin), ew ji şikefta Hîrayê vegeriya, dilerizî û derbasî cem Xedîce xanim (Xweda jê razî be) bû û got: Min binixumîne min binixumîne! Ji vê xalê doza yekbûna Xweda, nehevpariya tu kesî pê re û mizgîniya bi dilovaniya wî dest pê kir. Di wê demê de, temenê Pêxember (silavên Xweda lê bin) çil sal bû.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Firişteyê peywendîdar ê nameyên Xweda dighandin pêxemberan?** | Mîkaîl ○ | Cibrîl √ | Îsrafîl ○ |
| **Cihê ku Pêxember peristin lê dikir, heta ku peyama xwe eşkera kir?** | Bexçeyên Meka ○ | Şikefta Hîrayê ○ | Eltaif ○ |
| **Ji mêran kesê pêşîn ê ku bawerî bi gotinên Pêxember anî?** | Ebdulah Bin Mes`ûd ○ | Osman Bin `Efan ○ | Ebû Bekir El-Sdîq ○ |

## Çalakî

Xedîce xanim (Xweda jê razî be) ji bo ku Pêxember (silavên Xweda lê bin) dilaram bibe, jê re weha got: Mizgînî li te! Bi Xweda! Dê Xweda te tu carî vala dernexe; tu bi ser xizmên xwe de diçî, tu rast dipeyivî, tu alîkariya kesê lawaz dikî û didî kesê xizan, tu mêvanan dihewînî û di tengasiyê de, tu bi kêrî mirovên ku bobelat bi sere wan de hatiye, tê.

◙ **Taybetiyeke Pêxember (silavên Xweda lê bin) ku di gotinên Xedîce xanim de, derbas nebûye, binivîsim.**

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Pêxember (silavên Xweda lê bin) ji bo doza baweriya bi Xweda, wek mizgîn û hişyarker hatiye şandin.
- Xwedî sincên bilind bim ên ku Pêxemberê (silavên Xweda lê bin) me bi wan dihat naskirin.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Mêvanperwerî yek ji sincên herî bilind e. Ez ê bi malbata xwe re di derbarê parastina vê çandê de, gotûbêjê bikim û di lênûsa xwe de binivîsim.**

# Zimanparêzî

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Ebû Hûreyra (Xweda jê razî be) got: Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: Kî baweriya xwe bi Xweda û Roja Axretê tîne, bila tiştê qenc bibêje yan bêdeng bimîne.
**(Buxarî û Muslim)**

- **Pêxember (silavên Xweda lê bin) baweriya bi Xweda, bi çi ve girê daye?**
- **Di rewşên ku em nizanin çi bibêjin, çi sûdên bêdengiyê hene?**
- **Gelo pileya axaftina bi ziman ji pileya kirinê kêmtir e?**

## Ez encamê jê digirim

- Yek ji pileyên baweriya bi Xweda, zimanparêzî ye.
- Mirov ji her peyva ku ji devê wî derdikeve, berpirsiyar e.
- Zimanparêzî xweşiyeke sûdmezin e.
- Divê mirov çavdêriya gotinên xwe bike û ji bilî qenciyê tu tiştekî din nebêje.

## Guhdarî bikim û bersivê bidim


قَالَ تَعَالَى:

﴿وَقُولُواْ لِلنَّاسِ حُسۡنٗا﴾ البقرة [٨٣]

- **Xweda di ayeta pîroz de, çi ferman li me kiriye?**

## Çalakî

Divê mirov bi kesên din re zimanxweş be. Pêxember (silavên Xweda lê bin) gotiye: "Gotina xweş sedeqe ye."



## Ez ji waneyê fêr bibim

- Zimanê xwe biparêzim û tenê bi qencî biaxivim.
- Ji bo ku ez razîbûna Xwedayê payebilind qezenc bikim, divê ez zimanê xwe biparêzim.
- Ji ber ku bandora zimanparêziyê li hizirkirina berî axaftinê heye, zimanparêzî pendyariya mirov zêde dike.
- Rastbûna ziman, dibe sedema rastkirina kiryaran.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi hevalên xwe re, di derbarê nimûneyên din ên zimanparêziyê ên ku di waneyê de dabaşa wan nehatiye kirin, gotûbêj bikim û li lênûsa xwe binivîsim.**

## 4 Destepakî (sparte)



### Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿إِنَّ ٱللَّهَ يَأۡمُرُكُمۡ أَن تُؤَدُّواْ ٱلۡأَمَٰنَٰتِ إِلَىٰٓ أَهۡلِهَا وَإِذَا حَكَمۡتُم بَيۡنَ ٱلنَّاسِ أَن تَحۡكُمُواْ
بِٱلۡعَدۡلِۚ إِنَّ ٱللَّهَ نِعِمَّا يَعِظُكُم بِهِۦٓۗ إِنَّ ٱللَّهَ كَانَ سَمِيعَۢا بَصِيرٗا ٥٨﴾ النساء (٥٨)

- **Li gorî têgihiştina te destepakî (emanet) çi ye?**
- **Heger destepakî nebe, mirov dê çawa bi hev re têkiliyan bikin?**

### Ez encamê jê digirim

- Destepakî sincekî mezin e, ew tê wateya rastpêkanîna kar, pêkanîna sozê û li ser vê yekê, berdewamkirin e.
- Ji bo ku Xweda pileya destepakiyê bilind bike, destepakî bi dadmendiyê ve, girê daye.
- Kesê destepak ji aliyê Xweda, Pêxember (silavên Xweda lê bin) û mirovan ve, tê hezkirin.

### Çalakî

Destepakî, nîşaneke li ser temambûn û xurtbûna baweriyê ye. Divê her kes vê taybetiyê di giyanê xwe biçîne û di jiyana xwe ya rojane de, pêk bîne.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Ji nasnavên Pêxember** → | ........ | Rastgo | ........ |
| **Ji awayên destepakiyê** → | Destepakî di bazarê de. | Razgirî di dibistanê de. | ........ |

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: "Xweda ji wê yekê hez dike; gava ku mirovek karekî bike û di wî karî de, şareza be.

| | |
|---|---|
| **Parastina sparteyê.** | Çavdêriya gotinan. |
| **Destepakiya di kar de.** | Taybetiyên kesên din eşkera nekin. |
| **Destepakiya di axaftinê de.** | Karkirin bi rijdî û şarezayî. |
| **Destepakiya di razê de.** | Vegerandina sparteyê ji xwediyan re. |

(An arrow links "Destepakiya di axaftinê de." to "Çavdêriya gotinan.")

## Çalakî

Bi qasî ku em di gotin û tevgerên xwe de, destpak bin, ewqasî hevgirtina civaka me xurt dibe.

| | | |
|---|---|---|
| **Min ji hevalê xwe re balafirek kaxezî mîna ya xwe, çêkir.** | → | Destepakî di kar de |
| **Hevala min razeke ji min re got û min ew raz parast.** | → | ......... |
| **Bi cîranan re zimanê min xweş e; gotinên min ne ziyanker in.** | → | ......... |
| **Min çenteyê birayê xwe parast, heta ku ji dibistanê vegeriya.** | → | ......... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Destepakiya min navnîşana rastiya min e.
- Bi destepakiyê razîbûna Xwedayê xwe û hezkirina mirovan, qezenc dikim.
- Ji bo ku ez razê weke sparte biparêzim, razên kesên din eşkere nakim.
- Destepakî hevgirtina civakî xurt dike.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Bi hevalên xwe re, di derbarê nimûneyên din ên destepakiyê yên ku di waneyê de cih negirtine, gotûbêj bikim û li lênûsa xwe binivîsim.**

5

# Hec



## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى:

﴿وَلِلَّهِ عَلَى ٱلنَّاسِ حِجُّ ٱلْبَيْتِ مَنِ ٱسْتَطَاعَ إِلَيْهِ سَبِيلًا﴾ آل عمران [٩٧]

- **Hec tê çi wateyê?**
- **Cihê ku peristina Hecê lê dibe, ku ye?**
- **Xweda, Hec li ser kê ji misilmanan, ferz kiriye?**

## Ez encamê jê digirim

Hec hîmeke ji her pênc hîmên bingehîn ên ola islamê ye. Misilman, serdana Mala Xweda (Ke`beyê) ya ku li Mekayê ye, dikin.

Ev serdan di rojên destnîşankirî (meha Zulhica) de pêk tê û ev peristin li gorî rêûresmên taybet, tê kirin.

## Çalakî

Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: "Gelî mirovan, Hec li ser we hatiye ferzkirin; biçin hecê."

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Mercên ferzbûna Hecê** | → | Islam \| Hiş \| ........ | |
| **Hec di jiyana mirov de, çend caran, ferz e?** | → | ........ | |
| **Destnîşanên Hecê** | → | Demî \| ........ | |

## Çalakî

Di Hecê de, hemû beşên civakê bê cudahî hevûdu nas dikin. Werzê Hecê, hevdîtineke salane dabîn dike û zêdeyî wê, mirov bi kesên zana re, danûstandinê dike.

| Encamên Hecê ji bo civakê | Encamên Hecê ji bo mirov |
|---|---|
| 1. Yekîtî, biratî û girêdanê di navbera misilmanan de çêdike.<br>2. ....................<br>3. .................... | 1. Misilman nêzî Xwedayê xwe dibe.<br>2. ....................<br>3. .................... |

## Ez ji waneyê fêr bibim

- Misilman, ji bo peristina Xwedayê mezin û razîbûna wî Hecê dikin.
- Di Hecê de, hemû misilman ji hemû nijadan, di cih û demeke destnîşankirî de, li hev kom dibin.
- Di Hecê de, hemû mirov dibin wekhev; tu cudahî di navbera kesê xizan û maldar û kesê bihêz û lawaz de, namîne.

## Ez têgihiştina xwe taqî bikim

**Di Hecê de, mirov hev nas dikin û têkiliyên biratiyê di navbera wan de zêde dibin. Di derbarê vê yekê de, ez ê nivîsekê ku sê xêzan derbas neke, binivîsim.**